

Nizanîya me bedbextîya me ye û bedbextîya me nezanîya me ye. Merov û Milet bi destên xwe ve mêjûwa xwe didin bidurustkirin; jibervêjî ez van Nivistên hanê bi hev re didim bidiyarîkirin, mîna ku Xanî di Nûbuhar de dibêje:

"Ne ji bona Sahibê Rewacan
Belkî ji bona Biçûkêd Kurmancan"

Gotina Werger

Xwendevanên hêja û birêz

Vaye ez piranîya Wergerandinên xwe bi Zarava Kurmançî ve li ber destên we de didim bidanîn. Ez naxwazim pêşgotinekê ji bona van Wergerandinên hanê bidim nivîsandin; jiber ku ez naxwazim serên we bidim bigêjkin. Belam ez dixwazim bes û bi tenha ve çend gotinan ji bona Xwendevanên Giramî bidim bitomarkirin.

Kur û kêmanîyên van Wergerandinan dê pirî zorbin. Ez ji dil û can ji Xwendevanan û Rexnevanan hêvîya lêbuhurandinê didim bidaxwazkirin. Ev karê biçûk xewin û nigaşa Zarotîya min ji bona pêşvexistina Zimanê meyî Perest û bêtir ronahîkirina Mêjûwa me ji bona Tudeyê Kurd dûr yanjî nêzîk dide bicîanîn.

Tevaya zanistî û zanebûna min bes û bi tenha ve dê di warê Ziman û Mêjûwa me de bête bitirxankirin; jiber giringbûna Zimanê me û Mêjûwa me ji bona Hebûna me, Azadîya me, Serxwebûna me, Pêkanîna Dewleteke Milîyî Serbixwe di seranserî Kurdistanê de û hêjbêtir xweşbûn û geşbûna jîna Civaka me hemû bi hemû ve di rêya pêşvexistina Zimanê me û ronahîkirina Mêjûwa me de tete bidîtin.

Dujminên me her û her him şerê Zimanê me û himjî şerê

Mêjûwa me didin bikirin. Di Mêjûwê de pir Milet hatin biwindakirin, gava ku wan Ziman û Mejûwa xwe ji nava destên xwe dane biberdan. Zimanê me bi hemû Zaravayên xwe ve mîna hemû Zimanên Rojhilat bi saman û dewlemend ve tête bidîtin. Ew bi karanîna kevnariya pir qert ve tête bidîtin. Pê ji bêtir Hezaran Sal Avesta hatîye binivîsandin. Destûr, Qanûn û Yasayên bi nav û bangên Mirovanyê ve pê hatine bitomarkirin.

Mêjûwa me bêtir ji Pênç Hezar Sal di nava Kurdistana me de di kanîyên Somerî de hatîye bitomarkirin. Hîç Mêjûwa Rojhilata Navînî bê Mêjûwa Kurd û Kurdistanê nayête biliberkevtin.

Em divê tevaya xebata xwe di her warekî Jînê û Serûştîyê de li ser bingehê Zanistîyê de bidin bidanîn. Hêjîbêtir divê ku em tevaya Zanebûn û Zanistîya Mirovanîyê bi Zimanê Kurdiyî perest ve li ber Tudeyê Kurd de bidin bidanîn. Karê me nebes tenê ku em Kurdistanê azad bikin, divê em Kurdistanê ji bona xwe re û Nifşên tên bidin biavakirin, bigeşkirin, bixweşkirin û bibextiyarîkirin.

Kurdistan bi saya dilsozîya me, zanebûn û zanistîya me ve dê bi Serxwebûnê û Pêkanîna Dewleteke Milîyî Serbixwe ve bête bitacûxelatkirin, dê ew xwe rast û durust ji gemera Evsana Buhuşta Erebbide birizgarîkirin û ew dê xwe bi Wêneyekî Cîhanîyî Dema Vejandinê ve ji bona nava Sedsalê Bîstûyekem bide biçengkirin .

Ev Wergandinên hanê di pêşî de bi şeweyê Sêlikekê ve têtin biderkevtin, da ku ew ji windabûnê bêtin biparastin û hêjîbêtir da ku ew bi lez û bez ve bi hemû kêmasîyên xwe ve ji bona nava destên Xwendevan û Xwendekarên Kurd bêtin bikevtin.

Kak Nêçîr Berzanî soz ji min re date bidan, ku ew van hemû Wergandinên hanê li Kurdistanê de bide biçapkirin, belam min nikarîbû alîyên teknîkîyên wan bidana biçarekirin. Min kir û nekir, ku ez bikaribim, wan li wêderê de li ser Kompiyuteran

de bidim biçapkirin; jiber ku cudabûna Sustêma nivîsandina min ligel sustêma Kompiyuterên wêderê de nedihate biderkevtin. Ez hêvîdarim, ku dê ezê vê kêmasîya hanê bi alîkarîya Karnasên Kompiyuter ve bidim biçarekirin.

Ez dixwazim li ser deqekê de bidim biaxivtin, ku ew ji min re pir bi giringî ve tete biderkevtin. Ev deqa hanê jî bi çend Tîpên Elfebaya me ve tete bivegirêdan: Şîn Ç Ê Û Î. Ev Tîpên hanê pir serêşîyê û sergêjîyê ji me re didin bidurustkirin.

Di vir de Ismet Şerif pir bi zanistîyeke bild û dûrbîn ve li wan de dayite bitemaşekirin û hêjbêtir pîrsa wan dayite biçarekirin.

Ismet Şerif wetov dide bipêşneyarkirin, ku Tîpên Şîn, Ç, Ê, Û, Î bi Sh, Ch, Ee, Ou, Ie bidin binivîsandin.

1. Ez vê pêşneyara Ismet Şerif ji dil û can pişta wê didim bigirtin, Belam ez wetov van Tîpên hanê Şîn, Ç, Ê, Û, Î bi Sh, Ch, Ea, Ue, Ie didim bipêşneyarkirin.

Cudabûn di navbera min û Ismet Şerif de bes û bi tenha ve di nivîsandina Tîpên Ê û Û de tete biderkevtin. Ismet Şerif wan wetov Û û Ê bi Ou û Ee dide bipêşneyarkirin û ez wan wetov bi Ue û Ea didim bipêşneyarkirin.

2. Hêjbêtir ku em bikaribin him bi vî şeweyê hanê û himjî bi şeweyê kevin ve bidin binivîsandin, tanî ku başîya vî şeweyê nuh yanî şeweyê kevin ji piranîya Xwendevan û Xwendekarên Zimanî Kurdî re bête biderkevtin.

Jibervêjî da ku li herderê de û li ser her sustêmeke Kopiyuterî de Xwendevan û Xwendekarên Zimanê Kurdî bikaribin binivîsandinên vê Sêlikê ji xwe re bidin biçapkirin, min ev hemû Wergerandinên xwe bi vî şeweyê nivîsandinê ve dane bitomarkirin.

Herwehajî da ku em di warê Internet de bikaribin ligel hevdû de bidin binivîsandin, li gora bîr û bawerîya min de divê em bi şêweyê nuh ve çî bi şêweyê Ismet Şerif ve yanjî bi şêweyê min ve bidin bikaranîn.

Ez dixwazim li vêderê de tevaya sipasîya xwe ji wan Mirovan re bidim bipêşkeşkirin, yên ku wan pir yarmetîya min di vî warî de dane bikirin û bi taybetî ez sipasên xwe ji bona Fewzî Esed didim pêşkeşkirin, jiber ku bi saya serê wî ve ev hemû karên hanê hatine bilêvenerandin û birastkirin. Herwehajî ez Dr. Ciwan Cuma didim bisipaskirin; jiber ku wî tevaya alîyên teknîkî di hemû nivîsandinên min de ji bona ser milên xwe dane bihilgirtin. Herwehajî ez sipasên xwe ji bona Dr. Fewzi Resul, Berzan Ahmed, Mizgîn, Mohemed Amîn Delavî û pir kesên din didim bipêşkeşkirin. Herwehajî ez Aram Xaçedoryan, Mohemed Şêxo, Şivanperwer, Gulistan, Şehreban, Nasir Rezazî û Ciwan Haco didim bisipaskirin, jiber ku piranîya van karan li ser awaz, aheng û dengên wan de dihatin binivîsandin. Di dawî de jî divê ku ez Malîya xwe Dêya Ciwan nedim bijibîrakirin, da ku ez wê bidim bisipaskirin; jiber bi bînerhbûn û alîkarîya wênayê pir bi nerx ve biserkevtina van karan hatîye bidîtin.

Dr. M. S. Cuma
Berlin, di 13. 10. 1997 de